Çîrokbêjiya Cegerxwîn

Nimûne: Reşowê Darî *

Heyder Omer

Ez ewha bawer im, ku her lêkolînerek di meydana çîrokê de berxwe bide, divaye ew destpêka vî celebê wêje wek berhemeke hunerî li nik kurdan û mercên jidayikbûn û geşbûna wî ji bîra neke. Eger ev yeka ji bîra bibe, gelek neheqî wê li çîroknivîsên kurd bibe.

Ev berhema hunerî ne ji demeke dûr de li ba kurdan hatiye naskirin. Hinek rexnevanên başûrê Kurdistanê çîroka **„Erê min di xewnê de dîtiye“** ku Cemîl Saîb sala 1925ê nivisandibû, wek destpêka vî celebê tore dibînin. Eger em jî xwe bidin kêlek wan, û vî celebê tore li nik jêrxetiyan bipelînin, pêşî em du çîrokan di hejmara duwem ya HAWARê de dibînin, ew jî **„Du egîd** û **Gundê nu ava“** yên Dr.K.Bedirvan û Qedrî Can in.

Digel hindê em di hejmara çarê de jî pêgî çîroka **„Ber tevna mehfûrê“** dibin. Tevî ku nivîsevanê wê C.Bedirxan, wek Dr.Husên Hebeş, di xebata xwe ya nirxbiha de li ser HAWARê, weha diçe, ku ev çîrok sala 1927ê li Bêrûtê nivisandiye, lê her du hejmarên duwem û çarem di sala 1932ê de derçûne. Lewre mirov dikare weha biçe ku çîroka hunerî ji wê salê de ketiye nav destên jêrxetiyan, û di dû re jî gelek nivîsevanên HAWARê, mîna Nûredî Ûsif (Dr.N.Zaza) ,O.Sebrî û yên din para xwe dixin evê meydanê, û dibine hevparên destpêkên vî celebê wêje li Jêrxetê.

Cegerxwîn jî sala 1941ê, di navbera hejmara 31ê re li vî deriyê tore dide, û çîroka **„Berhamê Gur“** diweşîne, û di dû re çîroka **„Çîm û Gulperî“** sala 1948ê li Şamê çapdike, û ya **„Reşowê Darî“** sala 1956ê dîsan li Şamê çapdike.

Ev çîrok bi xwe serpehatiyeke gelêrî ye, pirrê caran di civatên kurdan de dihate xeberdan, ta Cegerxwîn ew xiste durvê yekeke wêjeyî, û bûyer û kesên wê kirin sîmbolên nerîn û helwestên xwe yên civakî û neteweyî.

Bûyerên çîrokê li bakurê Kurdistanê li gundê **Darê** diqewimin, tehlî û dijwariyên jiyana gundiyan, û sitema rijîma tirkan û derebegên kurdan wêne dike, û destpêka hişyariya civaka kurdî ji warê civakî û neteweyî de dibelgîne, pêre jî ramana Cegerxwîn, ku dibêje (**qata jor sedema bindestiya gel û welatê wî ye**) û çareserkirina wê dozê. Li gor nerîna wî, numa dike.

Yekemîn car mirov vê çîrokê dixîne, pê hay dibe ew li goreyî merc û divîtiyên **awayê kevin, ku sê qunaxên wî hene, ava bûye**. Ango bûyerê çîrokê di sê qunaxan re derbas dibe.

Li destpêkê em dibînin dem şev e, gundî li eywana Zoro Axa civiyane, serpêhatiyan dibêjin. Lewend; kurê Zoro Axa laqirdiyan bi mêrxasiya Reşo dike, û wî neçareyî çûndina şeîkefta „ Berdewêl“ dike.

Li navînê Lewend ji civatê derdikefe, diçe mala Reşo, destan dirêj namûsa wî dike, lê Rewşê; pîreka Reşo, ji neçare wî dikuje, laşê wî perçe perçe dike, wan perçan dixe çewalekî, hildide milên xwe û berê xwe dide şikefta „Berdewêl“ da laşê perçekirî bawêjê binê şikeftê, û şopa wî wenda bike.Li wê derê pêrgî Reşo dibe, xişma ku hatiye serê wê jê re xeber dide, her du vêkre dizêvirin gund, diçin eywana Zoro Axa, û çîroka xwe û Lewend li pêş Êxe û gundiyan radixin. Çavên Zoro Axa sor dibin, dike qêrî û sûnd duxe, ku wê wan bikuje. Lê gundî piştgiriya Reşo û Rewşê dikin, lewre jî Zoro a dilê xwe vedişêre, û bi dizî mirovekî dişîne bajêr, da cendirman bîne, ku li gundiyan bidin.

Li dawiyê jî cendieme tên gund, gundiyan tev, digel Reşo û rewşê li mala Zoro Axa dicivînin, li wan didin, diravên wan distînin, hinekan ji wan berdidin, û yên mayîn bi xwe re dibin, lê bi rê de gundî diravan didin wan, û xwe rizgar dikin. Cendirme jî Reşo û Rewşê dibin û dixin zîndanê, û li dadgehê bi çend salan tên tawanbarkirin.Gundî jî dest ji kar û berdestiya Zoro Axa berdidin, loma jî Axe neçareyî koçbarkirinê dibe. Piştî çend salan Reşo û Rewşê ji girtîgehê tên berdan, dizêvirin gundê, û tev gundiyan jiyana xwe didomînin.

Dêmek Cegerxwîn bûyerên çîroka xwe, li goreyî pêdiviyên evê rêgaya kevin, bi awakî dirist li pey hev rêzkirine, her yek bûye encam û bermayê bûyerê berê, û ji bo bûyerê din bûye sedema sereke, ango her yek ji wan bûyeran hem di bin bandûra yê beriya xwe de mayî, û hem jî li yê di dûv re tê hukardar bûye, ta ku çîrok gîhaye dawiyê, lê hinek bûyer lê zêde kirine, ta ku xwendevanê çîrokê, di navbera bûyerên wê re, pêrgî hineke dî dibe, ku ewana li gel bûyerên sereke ne têkildar in, wek çawa em dibînin axiftinên gundiyan, li goristanê, ji bûyeran bi dûr dikefin, û ne têkildar in. Lewre jî girêka çîrokê jihevketî xuya dibe.

Nivîsevan bi **çîrokbêjiya yekser** dest bi xeberdana bûyeran dike, lê li destpêkê xwe bi ser alava **zêvirîna hunerî** de pal dide, lewre dîroka Kurd a kevin tîne bîra xwe û me, wê bajarvaniya bav û kalan bi şûn xwe de hêştine şanî me dike „**Kî li rewş û hendesa kavilê (Darê) temaşe bikî, mezinahî û jîngariya nijadê Kurd tê ber çavê wî“**. (Rûpel:4).

Di dû re wê bajarvaniya giranbiha dide hember rewşa Kurd ya îro, û pêre mijûl dibe, hîngê jê ve xuya dibe çendî miletê wî li paş mayî, û neyaran keys jê birine, ta ku îro nikare li welatê xwe serbest bigere „ **nivişt û nivîsaran bi zimanê xwe, û di biwara tarîxa nijad û welatê xwe de çêkin, û xwendevanên Kurd, ku di vav welêt de jî naxwazin, ya nizanin ji me re çêkin, û bişênin, ji xwe dijminê nijadê Kurd her û her xwastine û dixwazin ku ne tenê rewş û tarîxa welatê me, lê nav û nîşanê me jî ji rûpelê tarîxa cîhan windabikin, û bi carekê navê Kurd neyê xwendin.“** (Rûpel:4).

Ev awayê çîrokbêjiyê, ku jê re (**Zêvirîna hunerî**) tê gotin ji sînemayê hatiye wergitin, pêşî dawiya çîrokê, an jî dawiya bûyerê sereke pêşkêş dike, û di dûre jî sedem û bûyer û helwestên, ku gîhane wê dawiyê berçav dike. Lewre jî gava şûngirtî be , dibe ûşta serkeftina huneriya çîrokê. Lê mixabin ev gava, ku nivîsevanê me tê re derbas hundirê çîroka xwe bûye, bi carekê, li nik bûyerên çîrokê ne têkildar e, û pêre jî kêmasiyeke hunerî gîhandiye durvê wê û şêweyê xeberdanê.

Gava nivîsevan xeberdan, an çîrokbêjiya yekser, bikar tîne, hîngê ew rola dîroknivîsan dilîze, bûyeran xeber did, kesan pêşkêş dike, bizavên wan berbiçav dike, digel wan kesan û bûyeran meşîneke xweristî dimeşe, ta ew bûyeran digînin dawiyê. Ango ev cureyê çîrokbêjiyê rê nade nivîsevan, ku hêza xwe bide ser kesên çîrokê, wan bi xwe ve girêde, çiku zanîna wî bi wan ji ya wan xwe bi xwe ne pirtir e. Lewre jî ew çîrokê ji dûr de xeber dide, û kesan û bûyeran ji der ve de salixdide, lê nerx û wateyan ji xwener re dihêle, ku bi xwe têbighîne.

Çîrokbêjiya çîroka Reşwê Darî pirrê caran li tersî huneriya vî cureyê xeberdanê hatiye, û di bin hêza nivîsevan de milxwar xuya ye, hulma wî li ser wê gelekî giran e, û ew li gor daxwaza nivîsevan tê hûnan, ne li gor birêveçûna bûyerê çîrokê, pirrê caran hevpevînan dibirre, û ji helwestekê diçe yeka dine bê têkildar, ji bo xatirê ku dozekê yan ramaneke taybet, xwedî nerîneke polîtîkî yan civakî diyar bike

Nimûneyên ku evan gotinên me teqez dikin, di çîroka Reşowê Darî de pirr in, me gelek rûpel divên da em gîşkan bînin meydanê, vêca em dikarin berên xwendevanan ber bi rûpelê, 25 ta 53 de bidin, da bibînin çawa xeberdan ji birêveçûna bûyerê çîrokê bi dûr de dikefe..Ji ber vê yekê jî çîrok bê hemdî bûyerên wê dirêj bûye, û **dawiya wê jihevketî** xuya dibe.

Dawiya her çîrokekê, wek hêmanekî hunerî ku hevparê avakirina wê ye, gelekî nirxbiha ye, ji ber ku hemû deziyên bûyer tê de dicivin, û mebesta, ku nivîsevan ji bo diyarkirina wê dixebite, tê de numa dibe, lewre jî rexnevanên wêje vê dawiyê bi **gaveka ronîkirinê** dinavînin.

Bi rastî eger em li çîroka Reşowê Darî, bi 83ê rûpelên wê vegerin, em dikarin bibêjin ev dawiya, ku hemû dezî û hêmanên bûyer tê de dicivin û wateya bûyerê wê bi serî tînin, di rûpelê 60î de diyar e, gava Soro civandin û dandina diravan pêşniyar dike, û riya çûndina ba bervedêr şanî gundiyan dike, çiku wê hîngê dawiya çîrokê û çareserkirina doza Reşo, ku di çîrokê de bûye sîmbola doza cotkar û gelê kurd, sayî û zelal xuya dibe, ku wê di dadgehan re derbas bibe.

Ev kêmasiya çîrokbêjiyê siya xwe daye ser livandina **kesên** wê jî, wek çawa formê Reşo tê guhertin. Reşo gundiyekî reben e, li ber destên Zoro Axa, mîna hemû gundiyên din, dixebite, jîr e, mêrxas e, dilsoz e, û nezan e. Ew, di civakê de, bi van rûçikan tê naskirin. ,,…**peyayên wek Rêşo gernas û mêrxwas, ku di rojên reş de kozik û çeperê dijmina diherivênin, mêra dikujin, talana vedigerênin…".(**Rûpel: 15).

Lê mixabin Reşo mêrxwasiya xwe biçûk û qels dike, ji ber ku li hember Zoro Axa gelekî sist û jar xuya dibe."**Axa ha serê mi û şûrê te, namûsa me teva namûsa te ye , emê tev rojekê xwe di ber te de bidin kustin, tu serê me, û em lingê te ne.**" (Rûpel: 19).

Lê xeyala Cegerxwîn ji nişkave Reşo bi awakî din şanî me dike, ku ew serê xwe bi dozên mezin re dêşîne, û bi sergêrên cîhnê mijûl dibe."**Gerek mirov bêtir bîr bibira, bibûna dost û birayên hev, ev çi kuştin, talan, ceng û pevçûne?. Xwezî ev awa ji nav me rabûna, xwezî me zanîbûna ka dermanê rabûna vê berberiyê çî ye?. Ma ev dinya têra me nakî?. Ev top, bumbe, gule, berik diteqin, mirova dikujin, xaniya dişewtênin, avaniya hildiweşênin, ev tev ji bona çî ye?. Xûyaye beg, axa, şêx mela nahêlin weke bira her kes bi hev re bikin, û bi hev re bixun, ev ristika komelî a sermayedarî nahêlî kes bi xweşî geza nanê xwe bipûrisênî, ev ristik tim kuştin, pevçûn, talan, û şewatî diafirênî .A çê eve ku em terpelozekê li wan deynin, va xwînxwar û dijmina teva bikujin.**" (Rûpel 38 – 39).

Ev pêşkeşkirin evê kesayetiyê ji birêveçûn û meşîna xweristî bi dûr dixe, û dide xuyakirin ku çîroknivîs ji rastiya hunerî ya çîroknivîsînê û avakirina kesayetiyê bi alîkî din de dikefe. Divaye çîroknivîs kesên çîrokê bi xwe ve girênede, divaye destê xwe ji wan bikşîne, da ewana gotinên xwe bibêjin, ne yên çîroknivîs bicûn. Mirovê ku xwe bide şûna lingên dijminê xwe wê ne bizanibe evan gotinên jorîn bibêje, û ne jî wê karibe li evan helwestan xwedî derkefe.

Pênûsa çîroknivîsê me li ba kesayetiya Soro jî riya xwe şaş dike. Tevî ku ev serpêhatî ya Reşo ye, lê Soro rola sereke di çîrokê de dilîze.Ew zana ye, hêdî ye, li gel xwe mijûl dibe, û dipûnije, baş guhdar e, gotin û bersivên wî pîvayîn in, li ba gundiyan xwedî rûmet e, bandûra wî li wan mezin e. Zoro Axa jî hesabê wî dike.

Mirov dikare bibêje, ku çîoknivîsê me evê kesayetiyê, li gor nerîn û ramana xwe, ji bo serkêşiya gundiyan amade kiriye, çiku ew şiyar û zana tê xuyakirin, dost û dijminê xwe ji hevdu vediqetîne, nirx û bihayê xebata cotkar û gundiyan baş naskiriye, dibêje Zoro Axa: **„Ma ku em ji cem we barkin, wê çi rûmet ji wer e bimênî?.. Ev mezinahiya we tev bi me ye, çi bi wijdanê we hatiye ku bi ser de jî hûn dor namûsa me bigerin?.“** (Rûpel: 15).

Lê mixabin gava dem lê tê, ku ev serkêşê gundiyan çareyekê ji bo serpêhatiya Reşo bipelîne, çîroknivîsê me bervê wî ber bi dandina bertîlan û bervedêr û dadgehan de dide.**“Heke bi a min dikin emê bêşekê bavêjin ser hevala, heme her yek karibin çi bidin, û hin ji hevala ku nikarin xwe li ber dara bigrin, bere birevin, xwe bidin alîkî, wê paşê bi kêrî me bên, evê dî ne mêra bikujin, û ne li cendirman xin, û ne jî kesî talan bikin, emê çendeka ji xwe vebjêrin, bişînin bajêr, bere ew jî gilî bikin, bervedêrekî bigrin, bawer dikim emê zora Zoro bibin“**.(Rûpel: 60).

Ev guhrtina helewsta ramanî ya vê kesayetiyê, ewê ji birêveçûna wê ya hunerî, ku çîroknivîs li destpêkê wênekiribû, bi derdixe, û bergehekê dixe navbera gotin û kirinên wê de, pêre jî, tevî ku ew kesayetiya sereke ye, yekeke lerzandî dimîne, û nikare şûna xwe, li gor pêdiviyên destpêka, ku pê hatiye naskirin, dagre.

Kêmasiyên hunerî û ramanî, ku di wênekirin û livandina evan her du kesayetiyan de peyda bûne, û cureyê ramana Cegerxwîn, nivîsevanê me neçareyî hebûna hinek kesayetiyên din kirine, mîna dozdar û fermandarê dadgehê û bervedêr,lewre jî rola wan di çîrokê tenê helwesta Cegerxwîn a êdyal numa dike, û ji wê pê de bê nirx dimîne.

Lê bi rastî pênûsa nivîsevanê me hin caran hostevaniya xwediyê xwe, di warê wênekirina kesayetiyên çîrokê de, bi awakî zor jêhatî dide xuyakirin, nemaze jî ewan kesayetiyên gelêrî,mîna Bizdo, Hovo;lalo, Çekûso, Şêro, Perîşanê û Silo, ku di çîrokê de bûne sîmbolên asta têgîştin û hişyariya civaka kurdan ya wê demê, ku pirrên endamên wê bi mezinahiya axa û began, û serdestiya turkan; birayên misilman zor bawerbûn. Her weha nivîsevanê me di wênekirina kesayetiya Zoro Axa de jî serkewtî xuya ye. Ev kesayetî sîmbola qata jor e, her tim dilsozê berjewendiyên wê qatê dimîne. Koçbarkirina Zoro Axa ji gundê xwe, bi qaserî ku bûye nîşana ramana Cegerxwîn ya êdyal, nabe nîşana guhertina rêveçûna hunerî ya vê kesayetiyê.

Tiştê balkêş di kesayetiyên çîoka Cegerxwîn de ewe, ku hemû sade ne, hundirê wan eşkera ye. Ango hundirê hemûyan vekirî ye, zû têne naskirin, ji ber vê yekê jî çîroknivîsê me monolog bikar ne aniye.

Monolog hêmanekî huneriya tevna çîrokê ye, dikare rê li pêş xwendevanan dûz bike, da derbas hundirê derûnên kesayetiyên çîrokê bibin, dijayetiya hundirîn, ku di derûnên wan de dikele, û siya xwe dide ser helwestên wan, nasbike. Nivîsevanê me kar û barê vî hêmanê hunerî hildide ser milên xeberdanê, û hemû helwestên kesayetiyan di wê riyê re şirove dike, lê gava xwe neaçareyî bikar anîna monologê dibîne, dîsan ewê li gor asta têgîştina xwe dixebitîne, pêre jî avakirina kesayetiyê jihev dikefe, wek çawa li nik Reşo diyare, ku ew kesê reben û nezan, şûnpêyên Zoro Axa serê xwe bi sergêr û dozên mezin dêşîne.Lewre jî tenê çîrokbêjî û hevpeyvîn di destên çîrokbêjê me de mane, ku kesên çîrokê bighînin hevdu.

Hevpeyvîna hunerî axiftineke di navbera du, an pirr, kesan de digere, zindîbûnê dixe hundirê çîrokê, kesayetiyan wêne dike û dide naskirin,perdeyan ji pêş wan radike, û ji bo mebesteke hunerî tê xebitandin, bi ser de jî zanîn û rewşenbîriya çîroknivîs numa dike. Lewre kar û barê hevpyvînê ne xeberdana bûyerên, ku bi kesan re diqewimin e, belê karê wê ewe, ku bide xuyakirin ka ew kesana çawa bûyeran dijîn. Ji ber vê yekê, divê hevpevîn li gor astayê zanîn û hişyariya kesên çîrokê , û tenga helwestên wan be.

Mixabin hevpeyvînên çîroka Reşowê Darî didine xuyakirin, ku karmendiya evî hêmanê giring li pêş çîroknivîsê me ne sayî bûye. Çiku ew pirrê caran destên xwe ji kesên çîrokê nakşîne, ku ewana li gor asta zanîna xwe bipeyivin, belê ew bi xwe gotinan li ser zibanê wan dibêje, û hevpeyvînên wan li gor zanîna xwe digerîne. Yek ji kesên çîrokê dibêje: **„Ew dewlemend û xudî gund dixwazin her ji çend sala kuştin, talan, şewat bikevî welêt, da karibin her tiştê xwe giranbiha bifroşin, û rebenê weke me bi nan-zikê karê xwe bi wan bigerênin“**. (Rûpel:48).

Bê guman xwediyê van gotinên jorîn zana tê xuzykirin, lê Cegerxwîn bi carekê, di çîrokê de, nedabû xuyakirin ku ji bilî Soro kesên zana li gundê Darê henin, vê lomê em dikarin ne tenê bibêjin ku pêjna Cegerxwîn ji van boçûnan tê, belê teqez ev boçûn û gotin yên wîn in, ne yên kesên çîrokê nin.

Tiştê me bi ber ve vê baweriyê de dikşîne ewe, ku xwediyên vî cureyê gotin û boçûnan, her car di çîrokê de bê navin, ne nas in. Bi ser de jî hin caran du astayên zanîn û hişyariya kesayetiyekê xuya dibin, bê ku pêjna guhertinên ramanî û hişyarî ji wê bê, wek çawa xwendevanan Reşo naskiribûn.

Pênûsa Cegerxwîn gelek caran li hember bikaranîna hevpeyvînê jar xuya dibe, û nikare dagere asta zanîna kesên çîrokê, pêre jî pirrê caran hevpeyvîn ji gewdeyê çîrokê direve, û nikare şûna xwe ya rast tê de bigre.

Evê yekê pirrê caran ziyneke giran kişandiye ser **zimanê** çîrokê, û ew ji jiyana rojane de bi dûr xistiye. Ziman alaveke giringe, ne tenê çîrokê ji awayê lêvanê dikşîne formê nivîskî, belê bi ser de jî her ku ji jiyan û têkilî û danustandinên rojane ve nêzîk be, ewqas heyama çîrokê zindî dike. Lê gava nivîsevanê me hêza xwe dide ser kesên çîrokê, û wan li gor asta zanîna xwe bi dengkirin dide, hîngê zindîbûna zimanê çîrokê birîn dike, û pêre jî bergehek dikefe navbera bûyeran û heyama çîrokbêjiyê, ku ne tenê hewesa xwendinê li nik xwener sist dike, belê bi ser de jî huneriya çîrokê jar dike.

Xuyaye çîroknivîsê me bi neyêniya akama vê yekê haydar bûye, çiku carcaran zimanê çîrokê ji heyama rojane, û jiyana gundiyan ve gelekî nêzîk dibe, û rola xwe ya hunerî di wênekêşiya heyama civaka gundiyan de distîne, wek çawa nivîsevan bi zibanê kesekî çîrokê dibêje: **„Ma xwe ne em jinê wa ne, nikarin dengê xwe bikin“**. (Rûpel: 14).

Gotinên bi vî awayî, pirrê caran di civatên gundiyan de têne gotin, û digerin, nemaze gava mirovek zora xwe bajo ser kesên din.

Bi rastî zimanê çîrokê ji vî warî de dewlemend e, pirrîcar xwener di nav re pêrgî cureyê raman û pûnijiya gundiyan dibe, mîna evê gotina, ku di pesna jîrîtî û jêhatiya jinekê de, li ser zibanan her tê gerandin **„ Jin jî hene, jinkok jî hene, wey tu diya min bî Rewşê!!.“** (Rûpel:16).

Ji vê pê ve zimanê çîrokê sade û gelekî hêsan e, bêjeyên wî numa û servekirîn in, û bê pêjin in, lewre jî hevok û derbirinên nivîsvan eşkera û bê girêkên zimanewanîn in, lê pirr caran dirêj dibin û hêmanê tevgerê di çîrokê de jar dikin.

Tevî evan têbîn û nerînên me, (Reşowê Darî) wê wek çîrokekê ji bermayên nifşê pêşengên wêjeya kurdî li Jêrxetê, bimîne, dikare, li gel berhemên endamên wî nifşî, destpêkên çîroka hunerî li vê devera kurdistanê diyar bike.

** Ev babet bi awakî firehtir, di durvê kitêbokekê de, li çapxaneya HAVÎBÛN, li Berlînê sala 2003, hatiye çapkirin.*